

Konferansê şeşemîn li hember erkên rewşenbîriya neteweyî

Girêdana konferansê salane yê şeşemîn yê Kombenda Kawa bo Çanda Kurdî ne karekî rotînî-rêkxistinî bû weke ku bi piranî di tevahiya dezgeh û komeleyan de pêktê, lê bûyereke berz bû di rojeva Kombendê de ku îsal derbasî 30`saliya xwe dibe. Cara yekem bû ku konferans hijmara neteweyî çandî temam dike bi beşdarbûneke aktîv ji seranserê Kurdistanê ne tenê di kar û barê rûniştinên civînê de ya ku amadebûneke mezin bi xwe girt ji aliyê elîtên siyasî û rewşenbîrî û civakî yên Kurdistanê, lêbelê di tevahiya pile û pêgehên Kombendê de nexasime komîteya wê ya birvêbira giştî.

Ji aliyê din ve, konferansê şeşemîn wêneyek zindî ji radeya rêzgirtinê ya ku Kombend dibîne ji aliyê gelê me yê herêma Kurdistanê û cemawerên Hewlêra paytext, destnîşankir. Di sentera rewşenbîrî ya zanîngeha Selahedînê de-ciyê lidarxistina konferansê-piraniya serkirdayetiyên perlemanî û hikûmî û hizbî û pêkhateyên beşên ragihandin û çandê û jîngeha akadîmîk û zanîngehê amade bûn. Guman têde nîn e ko konferansê şeşemîn qonaxeke berz di jiyana Kombendê de bû û referandumeke siyasî û rewşenbîrî bû derbarê pileya berz ya ku Kombenda Kawa di dil û wîjdana cemawerên Kurdistanê de digire, û razîbûna wan ji destkeftî û rêveçûna Kombendê û rêbaza wê ya neteweyî û dêmokiratîk. Her weha, ev rastî di axaftinên birêzan sekreterê polîtbîroya PDK-ê û parêzgarê Hewlêrê û nûnerê parlemento û serokê zanîngeha Selahedînê de jî hate xuyakirin.

Pêşxistin û bihêzkirina naveroka rewşenbîriya neteweyî ya Kombenda Kawa li benda avêtina hindek gavên piratîk e berev bi cîanîna erk û xwestekên pilankirî bi armanca kûrkirin û firehkirina rola Kombendê di bizava rewşenbîrî de ya ku eniya pêşîn tê hesêbê di xebata niştimanî û dêmokiratîka kurd de li hemberî erk û rengên tepeseriya neteweyî–çandî, tiştê ku divê komîteya birêvebir û komîteyên din berçav bigirin û amade bin ku beşdarî konferansa heftemîn bibin û wan erkên ser milê xwe bi tevahî bicîkiribin.